



**Navenda Hevkariyê ya  
Partiyên Kurdistanana  
Îranê 11.emîn civîna  
xwe pêk anî**

»»» R:3



*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd  
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne [www.kurdistanmedia.com/kurdî](http://www.kurdistanmedia.com/kurdî)  
[www.agirimedia.org](http://www.agirimedia.org) Hejmar (343)05-02-2019 Buha (1000) Tûmen

## 40 salan bextreşî



Çil sal bi ser van rojan re derbaz bû, ku civaka Îranê digel komeke guherînkariyên bingehîn ên siyasî, aborî, û civakî bebirû bû. Guhertinek ku ne tenê di berjewendîya azadîxwazan û guherînxwazan de nebû, belkû bû sedema bextreşiyekê ku heya niha jî berdewam dike.

Baldaneke kurt bi karnameya 40 salên derbazbûyî ên Komara Îslamî a Îranê ku bi mifaha şaş wergirtina taqmeke axûndên oportonîst ji hesta mesebî û hestyariya xelkê hatin ser kar, nîşan dide ku ne tenê hewlên Wilayeta Feqîh bo sepandina îdeolojiya xwe serkevî nebûye, belku bûye belgenameyek li ser mayepûçbûna vê rejîmê.

Bo selimandina vê rastiye, pêwîst e ku em îşare bi hinek amar û datayan bikin, ku mixabin li ber nebûna datayên bawerpêkirî, emê îşarê bi amarên

»»» R:2



## Daxuyaniya Partiya Demokrat a Kurdistanana Îranê derheq koça dawiye a Mîr Tehsîn Beg

»»» R:2

## Çileya Tazîdari- yê

»»» R:2



## Dewreya 234 a dest- pêkî ya Pêşmerge li ser çiyayên Kurdistanê bi dawî hat

»»» R:3



## Xalê Selîm û zîn- dana Diyarbeki- rê

»»» R:4



## Dîsan Destê Îranê Tê De Ye

»»» R:5



## Rejîma Îslamiya Îranê rejîmeke çend rû

»»» R:6



## Çil sal teror û cinayet

»»» R:7



## Sergotar

Çileya  
Tazîdariyê

N: Kerîm Perwîzî



Di hinek ji kultura neteweyan de, dema ku kesekî wan ê ezîz koça dawiyê dike, tenê sê rojan jê re taziyê dadinên, û merasimê jê re digrin. Hindek kultur jî hene, ku tenê merasimeke taybetî di roja bi axê spartinê de digrin, û êdî taziyê domdirêj jê re nagrin.

Di yek ji welatên Amerîkaya latîn de jî, di salê de rojek hene bi navê roja miriyan, ku di vê rojê de, hemû xelk diçin serdana goristanê û mēhvandariyê li ser gora ezîzên xwe ên jidestçûyî didin.

Di Îranê de, bi taybetî di hinek ciyan de, merasimên taybet bo koçkiriyan zor in, ji birêkirin û bi axê spartinê ve bigre heya sê rojê û heftik û çile û salvager û ...hwd.

Dema ku malbatekê ew tazî hebe, ew qas merasim tene girtin, îca hekî xelkê welatekê û neteweyên wê tûşî bêçareyî û êşeke weha bin, gelo wê çiqas merasimên şîn û taziyê bêne girtin?

Eva çil sal in, ku xelkê Îranê tazîdar in, û hemû salekê di zivistanê de, ew şîna wan nû dibe, û birînên wan dikelin, û xwîn li ber wan diçe.

Hemû salekê di roja hatina vê taziyê de, rejîma deshilatdar cejna

## »»»» Doma manşetê

rejîma Îranê bixwe bikin, da ku em bizanin li gora amarên rejîmê bixwe jî be, eva çil sal in xelkê welat di çî rewşekê de djiîn:

-Di van 40 salan de, aliyê kêm 26325 kes hatine îdamkirin.  
-Di şerê Îran û Îraqê de aliyê kêm 225570 kes hatin kuştin, ku 36

hezar kes ji wan zarok û nûciwan bûn.

-Di vî şerî de 574101 kes kêmendam bûn.

-Di navbera sala 84 heya 97'an, 277 hezar kesî di bûyerên hatûcûnê de canê xwe ji dest dane.

-Di nava 190 welatan de, Îranê piştî Sîraliunê zêdetirîn amara mirinê di riyana de heye.

-Her sal 40 hezar keçên bin 15 saliyê tene zewicandin, û zêdetir ji 15 hezar kes ji wan telaqê wergirin.

»»»» Dom R: 8

## Daxuyaniya Partiya Demokrat a Kurdistanana Îranê derheq koça dawiyê a Mîr Tehsîn Beg

Rêberatiya Partiya Demokrat a Kurdistanana Îranê derheq koça dawiyê a Mîr Tehsîn Beg, Mîrê oldarên Êzîdî, daxuyaniyek belav kir.

Daxuyanî wiha ye;

Daxuyaniya Rêberatiya Partiya Demokrat a Kurdistanana Îranê derheq koça dawiyê a Mîr Tehsîn Beg, Mîrê oldarên Êzîdî

Em xembarbûna xwe derheq jidestdana vî kesatiyê naskirî tînin ziman, û divê derheqê de jî sersaxiyê didin oldarên Êzîdî bi giştî, û malbata wî a hêja û xizm û kesûkarên wî, û xwe bi şîrkê xema wan dizanin.

Mîr Tehsîn Beg, kesatiyekî olî û Kurdperwer bû ku temenê xwe di pêxema rênîşandana bi xwîşk û birayên me ên Êzîdî de derbaz kir, û hevdem kesatiyekî niştîmanî û Kurdperwer bû ku di tevgera Kurdan de li Başûrê Kurdistanê bandoreke berbiçav hebû. Bitaybetî jî di mijara qirkirina Êzidiyan de li Şingalê, ew hawara mezlûmbûna oldarên Êzîdî bû, û di vî derbarê de roleke bibandor hebû. Bêguman jidestdana vî kesatiyê binirx, ziyaneke mezin e ji bo hemû aliyên.

Rêberatiya Partiya Demokrat a Kurdistanana Îranê sersaxiyê dide oldar û xembarên koça vî mirovê mezin, û hêviya bêhnfirehiyê ji wan re dixwaze.  
Ruha wî şad be

## Rêberatiya Partiya Demokrat a Kurdistanana Îranê

8'ê Rêbendana 1397'an a Rojî

28'ê Kanûna Paşîn a 2019'an a Zayîn

serkevtinê bi ser azadiyê de digre, û li dewra gora azadiyê kom dibe, û mēhvandariyê dide, di heman demê de, xelkên Îranê û neteweyên belengaz jî, bi dizî ve, û di mal de tazîdar dibin li dewra nîşan (hêma) û tēhniyên azadiyê, ku çil sal in ji wan hatiye dizîn, û hatiye binaxkirin.

Rejîma Îslamiya deshilatdar di Tehranê de, renga xwe ji bo wan hemû tawan û hovîtiyên ku di pêxema mana xwe de kirin, amade nekiribûn, û her wekî ku ew dêwê ji Ewropayê ve hatî got, di rejîma wan de komonîst û bēdîn jî azad dibin! Lê dema ku çûne ser textê deshilatê, û kultura paşvemayî ya xelkê dîtin, ku çawa pêşwaziyê jê dikin, êdî timayiya wî çû deshilata heta-hetayî, û dema xelkê wêneyê wî di nav heyvê de didîtin, wî hewl dida ku heyvê ji wan bidize.

Çil sal in ku xelkê Îranê li dewra gora azadiyê de şîn û taziyê digrin, û rejîm jî govend û dilanê digre. Lê êdî di vî kultura nav Îranê de, derbazbûna çile, dawiya dewranekê û destpêka dewraneke din e. Niha êdî çile derbaz dibe û xelkê hêviya xwe bi vî rejîmê ve girê dane, û rejîm jî reşatiya mergê xwe bi çavên xwe dibîne.

Lê ji mergê rejîmê girîngtir, mergê kultura paşvemayî û faşîstî ye ku rê nehête dan, cardin wêneyê tu kesî di heyvê de bihê dîtin.



## Navenda Hevkariyê ya Partiyên Kurdistanê Îranê yazdehemîn civîna xwe pêk anî

**N**ûnerên partiyên endam li Navenda Hevkariyê ya Partiyên Kurdistanê Îranê civiyan, û di civînê de çend mijar û egerên li pêşiya bizava siyasî ya Kurd li Îranê gotûbêj kirin.

Roja Yekşemî (14'ê Rêbendana 1397'an) yazdehemîn civîna Navenda Hevkariyê ya Partiyên Kurdistanê Îranê bi mêhvandariya Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê hat lidarxistin.

Di civînê de, li ser çend mijar û bernameyên Navendê hate axaftin û çend biryar hatin dayîn.

Di civînê de dûmahîk guhertinên siyasî yên li Îran û Kurdistanê, rewşa Rojhilata Navîn û bandora wê li ser Îranê û egerên li pêşiya bizava Kurd hatin axaftin. Herwiha rewşa hestiyar ya niha û senaryoyên nezelal hatin şirovekirin û pêdagirî li ser yekrêzî, yekhelwestiya zêde ya hêzên siyasî yên Kurdistanê hate kirin.

Di beşeka din ya civînê de pîrensîpên Navenda Hevkariyê ya Partiyên Kurdistanê Îranê, bo alîkariya digel opozîsyona Îranê û çawaniya sîstema siyasî ya pêşeroja Îranê hatin pesendkirin.

Mijareka din ya civîna Navenda Hevkariyê ya Partiyên Kurdistanê Îranê, civîna Warşo (Lehîstan)ê bû, ku wê di demek nêzik de li ser ewlehiya Rojhilata Navîn û rola Komara Îslamî ya Îranê derheq têkdana aştî û aramiya cîhanê de were lidarxistin.

Di civînê de pêdagirî li ser girîngiya civîna navdewletî ya Warşo hat kirin, û hat gotin ku di vê di wê civînê de hewce ye ku bala beşdaran bo ser pirsgrêka Kurd û netewên din yên Îranê û herwiha siyaseta Komara Îslamî ji bona asimilasyona Kurdan, sepandina şer û milîtarîzekirina Kurdistanê, serkutkirina xelkê Kurdistan û inkarkirina mafên gelê Kurd û paremayîhêlana Kurdistanê di warên siyasî, aborî û civakî de, rola Komara Îslamî di alozkirina herêmê de û destwerdan di nav karên welatan de û piştevanîkirina terorîzma navdewletî û bernameya mûşekî yên rêjîmê bo berfirehkirina nearamyî di cîhanê de bê rakêşan, û her bo vê mebestê jî, Navenda Hevkariyê hinek bername danîn.

Di civînê de, piştî nirxandin û şirovekirina berfireh, çend bernameyên din yên Navendê, ku girêdayî mijarên roj yên Kurdistan û Îranê bûn, hatin pesendkirin.



## Dewreya 234 a destpêkî ya Pêşmerge li çiyayên Kurdistanê bi dawî hat



**M**erasima bidawîhatina dewreya 234 a destpêkî ya Pêşmerge li çiyayên Kurdistanê bi rê ve çû.

Li gora rapora nûçegihaniya malpera "Kurdistanmedia", roja Înê 5'ê Rêbendana 1397'an a Rojî, Dewreya 234 a destpêkî ya Pêşmerge li ser çiyayên Kurdis-

tanê bi dawî hat, û destyek ji lawên şoreşger ên Kurdistanê tevî refa Hêza Pêşmerge Kurdistanê bûn.

Destpêka merasimê bi xwendina sirûda neteweyî ya Ey Reqîb û herweha ragirtina deqeyekê bédengî bona rêzgirtina ji riha pak ya şehîdan dest pê kir.

Piştê Qasim Keleşî endamê Navenda Siyasî ya PDKÎ gotinên xwe pêşkêş kirin, û tê de tevî pîrozbahîkirina bidawîhatina serkevtiyane ya dewreyê, awirek li rewşa

siyasî ya Kurdistan û Îranê da, û îşare bi vê kir ku sedema hovîtiyên bêrehmane ên rejîma Îranê di çend salên borî de, tengavbûna di encama zextên navxweyî û derveyî de ye.

Piştê sirûdek li jêr navê "Kurdim", ji vehûnandina Bêhzad Qadirî beşdarbûyê dewreya 234 a destpêkî a pêşmerge, ji aliyê beşdarbûyiyên dewrê ve hate pêşkêşkirin.

Di beşeka din ya vê merasimê de, rapora perwerdehiyê ya dewreya 234 a destpêkî a Pêşmerge ji aliyê Bodax Bodaxî bi nûneratiya fêrgehê ve hate xwendin.

Piştê peyama dewreya destpêkî ji aliyê Leyla Dilpeşend ve hate pêşkêşkirin.

Herweha di beşeka di ya vê merasimê de, xelat bi ser kesên yekem heya sêyem di biyavê ceribandîna siyasî û leşkerî û nezm û disîplîn de hatin parvekirin.

Di nava vê merasimê de çendîn helbest û stran hatin pêşkêşkirin.

Ew merasim bi encamdayîna çend nimayîşên leşkerî ji aliyê beşdarbûyiyên ve dawî pê hat.

## Xalê Selîm û zîndana Diyarbekirê



Bûbê Eser

Piştî 12`ê Îlona sala 1980`î li Tirkîyê û li Bakurê Kurdistanê leşkerên Tirk ên faşîst darbeya leşkerî pêk anîn, da ku mesele Kurd û Kurdistanê ji kokê rakin. An li gor gotina wan, vê fikrê pûç û vala bikin.

Ji ber vê bû bi hatina derbaya faşîst, leşkerên Tirkan, agir berra Kurdistanê dan, ter û hişk bi hev re şewitandin.

Bi vê hêrsa kurdan bi saya vê darbeyê tune bikin, kî/ê diket ber wan bê ser û ber lêdan, êşkence û tiştên nedihat aqilan danîna serê wan.

Ji xwe mirov nikare behsa wan çiqas xwendevan û welatparêzin kurd di zîndana Diyarbekirê de bi cih bike.

Xezebeke weha dabûn ber xwe ku kî/ê biketa ber wan, û bi tirkî nizanîbana ew digirtin û dianîn wê zîndana xortên kurd yên welatparêz lê dinaliyan.

Rojekê dîsa Gardiyanan mirovekî temenê wî li dor 50-55 salan bû bi halekî xerab, bi lêdaneke ku mirov texmîn nedikir lê kiribûn û weke miriyekî avêtin qawîşa ez bi xwe jî lê bûm, û got:

-Divê hûn vî zû bînin ser heşê wî. Sirûdên neteweyî ên leşkerî heta du rojan divê hûn bi wî bidin ezberkirinê, ya na, hûnê hemî cezayê xwe bibînin.

Piştî çûyina Gardiyanan em li ser serê xalê Selîm civiyan, me av jê re anî û canê wî tevda angoy mesaj kir da ku êşa wî hinekî kêmbibe.

Piştî qederekê Xalî Selîm hat ser



hişê xwe, dema çavên xwe vekir ku em xortên ciwan yên di wê zîndanê de bûn, li dor wî bûn. Hema yekser weha got:

-Mala xwedê hezar caran ava be ku wan bê bavan ez anîm nava we. Nava van xortên ji bona azadiya welatê xwe bi şev û roj di nava xebatê de bûn. Êdî bimrim jî ne xema min e.

Me got xalo, hela hilma xwe veke, hinekî rehetiya xwe bigire, rojên li vir dê weha zû bi zû xelas nebin. Wextê me yê axaftinê dê pir be.

Bi vî awayê me ciwanên qawîşê xalê Selîm hinekî rehet kir, birînin di canê wî de vekiribûn, me li gor îmkanên xwe derman kir. Dûre min got:

- Xalê Selîm xêr e, gelo tu ji bona çî girtinî.

-Weleh ez jî nizamim, min weke me`imûrekî dewletê li daîreya nufûsê kar dikir. Rojekê çend polîsa hatin, gotin emrê girtina te heye. Destên min kelemçe kirin, çavên min girtin û ez birim bajarê mêrdîni cihê tehzîb û êşkenceyê. Êdî hûn dizanin ku li wir çî tînin serê me re. Karê wan bi qederê hefteyekê lêdanan min bû. Tiştên dipirsîn jî ev bû:

- Te çima alîkariya terorîstan û xainên vî welatî kirî ye. Her çiqasî min ev sûçê wan li min dikir qebûl nedikir, lê wan her bi ya xwe kirin, hal di min de nehiştin, û hatina min a vir ya

roja ewil we hemiyan bi çavên xwe dît.

Weke tê zanîn ku me angoy bi girtiyên wê zîndanê her roj meş û fêrkirina sirûdên leşkerî dikir, bi sa`etan em li derve di bin wê tava germ de bê av dihiştin.

Ji ber ku xalê Selîm bi temenê xwe mezin bû, ew dernedixistin meşê. Rojekê em dîsa hemî derxistin da ku meşê bi me bidin kirin. Em hemî derxistin û xalê Selîm weke her car bi tena xwe di qawîşê de ma.

Piştî meş û xwendina sirûdên leşkerê têra xwe li me dan, em xistin qawîşa me, dema em ketin hundir, em çî bibînin. Tiştê me dît, aya aya xalê Selîm e. Em çend kes bi ber wî de reviyayn, me halî wî pirsî û me got:

-Çi bûye xalê Selîm. Û got:

-Ma çî nebûye, ciwanên hêja. Dema hûn derxistin derve, serleşker û çend Gardiyan ketin hundirê qawîşê, ez ji ber wan rabûn ser xwe û ser leşker got: -Binêre Selîm efendî, em te dernaxin meşê, lê divê tu jî li qawîşê çî diqewime, kî vê qawîşê bi rê ve dibe, kî dibêje bi emrê komotanan nekin, divê tu ji me re bêjî. Heger tu her roj rapora xwe ya di vê derheqê de bidî, em ê te xenî bikin, yanî tadê û êşkencê li te nekin. Yan na, tê têra xwe êşkencê bibîni. Min jî got:

-Hûn bawer bikin ez yekî di halê xwe de me. Bi ciwan re tu eleqe-

dariya min tuneye. Kî çî dibêjin çî dikin nizamim. Tiştê ez dizanim hemî li gor qanûn û nizama we daniye dimeşin. Ji min bawer nekirin û gotin:

-Ji xwe çî tiştê xerab hene ji bin serê kesên weke te sal mezinan derdikeve. Ya tê bêjî, ya jî em ê dest bi êşkencê bikin. Min got:

-Bawer bikin tu kes çî tiştên xerab nabêjin, herkes li gor wê nîzamê jiyana xwe ya vir didomînin.

Li ser vê gotina min, gelekî hers bûn. Têra xwe li min dan, ez bi qasî wan xwest êşkence kirim. Taliya talî jî, (dawiya dawî jî) şîşa bi wan re, xistin quluka mêraniya min û badan.

Aha binêrin hê jî xwîn jê tê. Lê min tiştê negot. Ez ê nebêjim jî. Wan dilê xwe bi lêdana min rehet kirin, lê min jî tiştên wan dixwest neda wan, û dilê xwe rehet kir. Bila hûn sax bin û netirsîn xortno. Vana dijimin in, çî bînin serê me jî ne xem e. Divê hûn bi ya xwe bikin û ji bona doza gelê xwe heta ku hûn hebin, divê kar û xebatê bikin.

Li vê dinê tiştê herî xerab bindestî ye, koletî û bê dewletbûn e. Heta ku dewleta we çê nebe, wê kesên weke min û we di êşkencan de derbas bikin. Divê hûn jî li gor wê berxwe bidin. Dewleta xwe ava bikin da ku hûn ji koletî û bindestiyê xilas bibin...

## Dîsan Destê Îranê Tê De Ye



N: Jason Rezaian

W ji “Washingtonpost”ê ve:  
Hemîd Muxtarî

### Amerîkiyek din ji aliyê rêjîma Îranê ve hatiye destbiser kirin

Komara Îslamiya Îran derbazî 40 saliyê xwe dibe, lê ev rejîma li demekê de derbazî 40 saliyê xwe dibe ku hêj berdewam e di beşdarîkirin di gellek cîneyet û kiryarên dijîmîrovî di asta cînhanî de.

Îro rojê di salvegera dameziranida vê rejîmê de, bas ji vê hindê tê kirin ku welatiyek din yê Amerîkî li Îranê de winda bûye. Ev welatiye, weke gellek ji Amerîkiyên din ku berê hatin girtin, du-netewî nîne. Belku kêma endamekê hêzên deryayî yên Amerîkî bûye, ku bo serdana dezgîrana xwe sefera Îranê kiribû.

“Michael White”, 46 salî, bi pasporta Amerîkî, ku vîzaya torîstî ya Îranê li ser bû, sefera wî welatî kir. Wî di çend mehên derbazbûyî de çendî caran hatin û çûna Îranê kiribû.

Weke kesek ku heyamek zaf li Îranê de jîyan kiriye û xwediyê bergeya niştêhbûnê ya dirêjheyam bûme, bi piştrastî dikarim bêjim ku beriya ku rejîma Îranê îznê bide welatiyên Amerîkî bo ewê ku serdana Îranê bikin, bi hûrî lêkolînê li ser wan dikin û heta bikarin hewla bidestxistina zaniyariyan li ser wan didin. Her kesek ku derbazî Îranê dibe, vê yekê bi başî dibîne ku çawa li balafirgehan de tîn lêkolînkirin û gellek zehmet e



ku bi rêya mifahstandina xirab ji yasayê kesek bikar xwe derbazî Îranê bike.

Lê White, di meha heftan ya sala borî de winda bû. Diya wî ku rûniştîya başûrê Kalîforniyayê ye, forma windabûna kurê xwe bi destê xwe pir kir. Ji vê demê ve heta niha tu tiştek ji White nehatiye bihîstin. Dewleta Amerîkayê agehdar e ku Michael li Îranê, di zîndanê de ye û ragihandiyê ku dê ji rêyên curbicur we hewla xwe bide ji bo azadkirina wî.

Rejîma Îranê xwedî dîrokek dirêj ji destbiserkirina welatiyên biyanî de. Di piraniya keşan de, derkevtiyê ku tenê sûça wan biyaniyan li Îranê de eva ye ku ew xwedî regeznameya ne-Îranî ne. Eva jî tê vê wateyê ku welatê wan dê giringî û hewilên micid bin bo serbest berdana wan.

Bi barmitegirtina welatiyên biyanî bûye metodek sereke bo komara Îslamî ya Îranê li destpêka bidestxistina desthilatê heta niha. Terorîstên wê rejîmê ku weke dizên ser behrê ne, her dem hewl dane ji rêya bi barimtegirtina welatiyên biyanî, nemaze welatiyên Amerîkayî, welatek ku giringiyek taybetî dide welatiyên xwe, givaşê bixwe ser wan welatan.

Îran bi awayek fermî îtiraf bi revandina White Kiriye: 2 heftî beriya niha, gotebêjê wezareta derve ya Komara Îslamiya Îranê, Behram Qasimî, destbiserkirina White ragihand.

Lê wî tu îşareyek nekir bi sedema destbiserkirina wî yan çima wî heta niha û piştî şeş mehan ji destbiserkirinê, nekariye bi malbata xwe re pêwendî bigire.

Heyamek beriya niha jî, rejîmê, fîlmek ji destbiserkirina Nazenîn Zaxêrî li balafirxaneyê Tehranê de bilav kir.

Zaxêrî, welatiyek Îranî-berîtanîyayî ye ku ji zarokên xwe di Aprîla sala 2016`an de, di balafirxaneyê Tehranê de li dema ku dixwest ber bi Londonê birê bikevin, hate veqetandin û destbiserkirin. Zaxêrî li demekê de hate destbiserkirin ku bo derbazkirina te`itilatên xwe û serdankirina malbata xwe serdana Îranê kiribû.

Zaxêrî zêdeyî 1000 rojan e ku di zîndanê de ye. Nazenîn di zîndana Êvîn de bû 40 salî. Wê heya niha heta nekariye bo carekê hevjinê xwe, Richard, bibîne. Keça wan Gabriella, zarokê nav landikan de bû, dema dayka wê bi boxtana hewildan bo hilweşandina rejîma Îranê hat destbiserkirin. Gabriella niha 4 salî ye û tu tiştek derbarê diya wê nahê bîrê. Ew niha ligel dapîr û bapîrê xwe li Tehranê dijît û dikrare tenê 2 caran bi kurtî diya xwe di heftiyekê de bibîne. Li demekê de ku hewl û îdiayên rejîmê bo bi qina`etgihandina civaka cîhanî derheq gunehbarbûna kesên ku weke barimte di Îranê de hatine destbiserkirin, bê sûd bûye, lê di nav Îranê de, rejîmê jiyana wan barimteyan û kes û karên wan li ser serê wan

de herifanidye.

Di civakekê de ku tirs ji berpirsan bi awayek eşkere tê xuyakirin, kes û karên girtiyan di nav civakê de nahên qebûlkirin yan rêzgirin. Zaxêrî bo nîşandana nerazîbûna xwe derheq rewşa xirab ya tendurustiyê xwe û herwiha rênedana wê bo pêwendîgirtin bi malbata xwe, qirar e ku dest bi gireva birçîbûn bike. Ji bo zîndaniyên siyasî biryar û kiryarên han bi wateya destpêkirina xebat û herwiha nîşaneyê bêhêvî bûnê ye. Tu kesek nabe bikeve rewşek han de. Bi taybetî dayîkek bê guneh weke Zaxêrî ku xwediyê zarokê biçûk e.

Lê eva rêk ev kare ye ku rejîma Îran berdewam encam dide, revandin bûye yek ji fakterên sereke bo diyarîkirin û şikildana nerîna cîhanî derheq Îranê.

Heta niha ew yeka berdewam e, û berpirsên vê rejîmê hêj tu hewlek nedane bo guhertina vê siyasî. Peyama Îranê gellek rûn e: “Me tu problemek nine ji bo destbiserkirina xelkên bê guneh û têkdana jiyana wan ji bo bidestxistina armancên xwe.”

Heta dema ku ew rejîma dest ji vê siyasî û karê xwe yê gemar berdide, em dibe berdewam hewl bidin bo azadkirina kesên ku bêguneh ketine zîndanê de. Bê ew hewildana û eşkerekirina rastiyên, çî hêviyek ji bo azadabûna wan zîndaiyan yan veqerana wan bi awayek saxlem bo welatê wan tune.

## Rejîma Îslamiya Îranê rejîmeke çend rû



Cemal Fethî

Rejîma Îslamiya Îranê ku çar dehik e, deshilata xwe bi ser welatê Îranê de sepandiye, berevajiyê rejîmên din ên dîktator di niha û derbazbûyî de ji hemû çêwazan bo mana xwe mifahê werdigre, heya ji demokrasiyê jî.

Renge ji aliyê demokrasîxwazan ve, ew yek tawan be, ku çima peya demokrasiyê li rex nav û qewareya Komara Îslamiya Îranê bi kar tê, lê eva rastî be, ew rejîma rejîmeke çend rû ye, yan bastr e ku em bêjin pêkhateya rejîmê di edebiyata siyasî de, wekî rejîmeke "Haybêrt" yan têkelaw tê hesibandin, wate ew pêkhateya ku hem aliyê zibir heye hem jî aliyê nerm, lê bi giştî her du aliyên wê, di xizmeta berjewendî û mana vê pêkhateyê de ye, û demokrasi di destê rejîma Îranê de wekî şemşîreke dudev e, ku her du devên wê di berjewendiyên wê rejîmê de ne.

Demokrasî wekî pêkhate, bi vê pêkhateyê tê gotin, ku takên civakê tê de di biryardan û diyarîkirina qedera xwe de beşdar in û ew beşdarî ji riya hilbijartineke azad û yasamend ve rengûrûyeke demokratîk bi xwe ve digre, wate her takek di piroseya hilbijartinê de mafê tewaw heye ku kesê ser




bi xwe bo asta sere û biryardanê a hikûmetê hilbijêre.

Lewra niha piraniya herî zaf ya welatên cîhanê bi demokrat û komonîst û dîktator ve ji emrazên hilbijartinê mifahê werdgrin, û rewatiyê didin deshilat û hêza xwe, û di qonaxa piştre, ji riya yasayê ve, biryarên xwe di civakê de cîbicî dîkin.

Eva ku piroseya hilbijartinê yek ji pîvanên demokrasiyê ye, cihê behs û gengeşê nîne, lê eva ku hemû sistemeke hikûmetî îro rojê ji vê pîvanê bo rewayîdana bi dehsilata xwe mifahê werdgrin cihê basê ye, ji be rku dîktator he rji vê emrazê mifahê werdgrin ku demokrat jî mifahê jê werdgrin, lê li vir de çawanî û mîkanîzma piroseya hilbijartinê de yte ku piştî hilbijartinê çiyetî û naweroka hikûmetan eşkere dike.

Komara Îslamiya Îranê yek ji wan hikûmetên dîktator e ku



bi gez û miqesa xwe kincê demokrasiyê bo bejna civaka Îranê didirû, lewra ev rejîma ku çêdibe, wek rejîmeke çend rû bi nav bikin, ji emrazên hilbijartinê wekî mîkanîzmeke demokrasiyê mifahê werdigre, wate piroseya hilbijartinê di Îrana li bin destê Komara Îslamî û heta zêdetir jî di welatên demokratîk de bi rê ve here, û zêdetirîn têçû (xerc) jî jê re tê diyarîkiirn. Lê tenê xala ku hilbijartinên Komara Îslamî ji yên yasamend û demokratîk cuda dike, ew e ku di piroseya hilbijartinê ya vê rejîmê de rê bi cudahizrên vê sistemê nahê dayîn da ku di rikeberiyê azad de beşdar bin.

Yekem hilbijartina ku di dîroka Komara Îslamî de hatiye tomarkirin, hilbijartina vê rejîmê yan jî ya paşatiyê bû, ku di rastî de, rikeberî di navbera du dîktator yan rikeberî di navbera du pêkhateyên xirab de bû, ne rikeberî di navbera baş û xirabekê de, heki ne, bere-

**hilbijartina ku di dîroka Komara Îslamî de hatiye tomarkirin, hilbijartina vê rejîmê yan jî ya paşatiyê bû, ku di rastî de, rikeberî di navbera du dîktator yan rikeberî di navbera du pêkhateyên xirab de bû, ne rikeberî di navbera baş û xirabekê de**

vajiyê vê pêvajoyê, hilbijartin bi rê ve çûbaya, renga temenê xelkê Îranê bedela serkut û bindestiya dîktatoriya axûndî, digel azadî û demokrasiyê têkel bûbaya.

## “Mike Pompeo”: Me hevpeymaniyek li dijî gefên rejîma Îranê ava kiriye

“Mike Pompeo” Wezîrê Karê Derve yê Amerîkayê ragehand ku wan bona piştevaniya ji xelkê Îranê, û bona berbirûbûna digel gefên rejîma Îranê hevpeymaniyek ava kiriye.

“Mike Pompeo” Wezîrê Karê Derve ê Amerîkayê di peyameke vîdyoyî de, ji rejîma Îranê wekî yek ji gefên di asta civaka cîhanî de bi nav kir û ragehand ku Amerîkayê hevpeymaniyek pêk aniye bona berbirûbûna digel kiryarên rejîma Îranê ên li dervey sînorên wê

Ew peyama “Mike Pompeo” ku rasterast ji malpera Wezaretê Karê Derve a Amerîkayê ve hate weşandin, navbirî tê de got: Em rastî gellek gefan tîn. Hindek ji wan gefan gellek jî nû nînin. Mînaka wê jî kar û kiryarên rejîma Îranê ne li dervey sînorên wê

Wî biryar daye ku rojên 13 û 14`ê Şibatê jî, (24 û 25`ê Rêbendanê) konferansekê di Lehistanê de bi rê ve bibe. Konferansek ku bûye cihê nîgeraniya rayedarên rejîma Îranê. Wî ragehandiye ku ew piştevanê xelkê Îranê ne, û pêştir jî gotibû ku ew wekî Amerîka dixwazin dengê xelkê Îranê bibihîzin.

**Nerîna Lîderan**



**Trump:**

“Hêzên me li Îraqê wê bimînin da ku çavdêriya rejîma Îranê bikin”.



**Netanyahu:**

“Rojane em êrişên reîma Îranê ên saybêrî pûç dikin”.



**Erdogan:**

“Ti planeke Amerîka bo devera aram nîne”.



**“Maike Pompeo”:**

“Me hevpeymaniyek li dijî gefên rejîma Îranê ava kiriye”.

**Çil sal teror û cinayet**



**Selîm Zencîrî**

“Dadvanî, azadî û bextewerî” duruşmên qasidek xapîner ê azadiyê bûn ku 40 salan berî niha xelkê Îranê pê xapand, û li sibeha serketina şoreşa gelên Îranê de, xwînrijandin, daliqandin, çavsorî û hovîtî kire pênas û nasnameya alternatîva şoreşê û êrişê ser Kurdistanê, ji riya fermana cîhadê ve kire sergotara karnameya xwe. Şer bû nei’metek xwedayî û mafên mirovan jî bûye dîskorsek rojavayî û borjuwazî. Li jêr navê dijberiya bi vê dîskorsê re, cinayet nema ku nehê kirin. Hespê stemkariya xwe ew qas dane cilîdê, heta ku şoreşa gelên Îranê di bin e’bayê reşe Xomêynî û dardestên wî de, bûye dêwek hov û metirsîdar ku tenê xwîna zarokên xwe fir dikir.

Xomêynî mir, lê mîrat û mîrat-girên wî man. Ximên lertzok ên rejîmê ku li ser du stûnên “tepeserîya li hundir û hinartina şoreşê bo derve” hatibû ava kirin, erkê bihêztirkirina wan, ji Xamineyî û Refsencanî re ma. Eva bû ku ji bilî serkuta sistematîk li navxweyî welat, şemendefira terora rejîmê bo fetisandina dengên azad, cuda û dijber li derveyî welat jî herikî, û hovêtiya rejîmê sînor bezandin.

Hêdî hêdî rengê “hene”ya rejîmê kal dibû, û rûyê rastîn û tundûtûjî ê wê derket, lewma givaşên rojava bona sekinandina şemendefira terora li derve dest pê kirin, û karîn bo midehekê bidin rawestandî. Tevî hemû rojreşiyên, nîşek ciwan, zana û xwende pê gihîştibûn ku rengê siyasî dabûn civaka Îranê. Wê yekê rejîm neçar kir bi xwe bihese û senaryoya reformîstiyê bi rêbertiya Xatemî ê rûken lê derewîn bîne holê.

Xatemî li jêr wî navî de, civak kundirol, temenê rejîmê dirêj û



givaşên navnetewî jî li ser xwe kêmkirin.

Di qonaxa şûndetir de, bo domadnina serkeşiyên siyasî û leşkerî, çiraya bextê Ehmedînejadê dînik teyisandin. Yê ku wekî nûnerê Xamineyî û Spaha Pasdaran, di maşkanêyek siyasî de sermestê desthilatê hatibû kirin, dest bi elegkirin û dabêjtina civaka medenî kir ku di nav qobiya nîzame de (serbarê hemû zilm û felaketan) çilû dabû. Eva bû ku dîsan girtîgeh dagirtin, darên îdamê zêdetir kirin û...hwd. Ji hêla din ve jî dest bi şantaj û gefxwarinên dijî emperyalîstî û qumara navîkî bi têçû û sermiyanek zaf li ser hesaba xelkê belengaz û hejar kirin, ku paşan bûye sedema serhildana xelkê Îranê li jêr navê “Tevgera Kesk” û îzolekirina Îranê di asta navnetewî de.

Vêca bona xweparastin ji gef û givaşên navxweyî û derekî, dîsa senaryoya reformîstî li jêr navê dewleta “Dad û Hêvî” anîn rojevê, û qebaleya nîzame radestî roviyê binefşî (Rohanî) kirin. Rohanî ku bi sextekarî û xapandinê ve bala civaka cîhanî û bi taybet dewleta Obama kişandibû, hevdem li gel bertengkirina civakê, givaşên derekî li ser xwe rakirin û dest bi vejandina serkeşiyên siyasî, leşkerî û terorîstî li deverê de kir.

Niha ku 40 sal bi ser desthilatdariya vî rejîma devbixwîn re derbas dibin, tu guhertinek bi ser mentalîteya wê de nahatiye, û hespê dîktatorî û zêdexwaziya wan her bi lojîka serkut û şidetê

baz dide, û bi saya vî siyasî de, him Îran bûye girtîgehek mezin ji pêkhatiyên wê re, him jî bûye gefek mezin li ser dever û cîhanê. Lewma rege êdî ji wan re hêsan neçe serî. Çûnkî him xelk bi wan hesiya ye û ferqekê li navbera reformîst û pawanxwaz de nakin, him jî di bin siya dizî, talan, gendelî û dîktatoriya vî rejîmê de, Îran îzole û aboriya wê herifî ye, bêkariyê 20 milyonî û bêngdariya 6 milyonî bûye karesatek mezin, helawsan, giranî, hejarî û dehan diyardeyên metirsîdar ku ji deskevten buhagirane vî rejîmê piştî çar dehsalan in, gefek micid in li ser saxlemiya civaka Îranê û bûne hêvênê hêrsek pengurî ku gihaye asta teqînê.

Li asta derekî de jî, maytêkirin, dubendî û piştewaniya ji terore û serkeşiyên leşkerî, civaka cîhanî gihandiyê vî baweriyê ku ev rejîma “bi tu siratekê musteqîm” nîne, û ne bi sazan û rêketinan, û ne jî bi givaşan xwe naguherîne, û hêdî hêdî piske piska hizra guhertina rejîmê li derve jî xurttir dibe. Lê mixabin opozîsyonek yekgirtî weke alternatîv carê wunda ye, lewma li vî qonaxa hestiyar de hewce dike ku gelên Îranê bi ezmûnwergrtin ji her du rejîmên paşatî û îslamî, refên xebat û berxwedana xwe xurt û yekgirtî bikin, û li hewla cihgîrkirina sistemek sekolar, demokratîk a federalî de bin, da ku şibî şoreşa 1979’an, ji aliyê qasidên virok (derewîn) ên azadiyê ku paşan bûne cinayetkarên şerî û xwîna xelkê xwe xwarin, nehên xapandin û serê wan bê kum nemîne.

## YE nekarîn li ser "SPV" li hev bikin

**W**ezîrên Karê Derve ên YE nekarîn li ser pirograma şeweya karê taybet ê malî di navbera Îran û YE de li hev bikin.

Rojnameya "National abudhabi" piştî civîna Şevra Karê Derve a Ewropayê li Birokselê nivîsandîye, ku wezîrên YE di birokselê de nekarîn ku li ser pirograma şeweya karê taybet ê malî di navbera Îran û YE de li hev bikin. Herwisa wan biryar daye ku di asta wezîran de, di civîna Lehistanê ya ji bo aramî û azadiyê di Rojhilata Navîn de beşdariyê neke.

Bi vî halî jî, helwesta fermî ya vê yekîtiyê di pêwendî digel civîna Lehistanê hêştê jî eşkere nîne. Civîna Lehistanê di 13 û 14'ê Şibatê li Werşoyê bi piştevaniya Amerîka û Lehistanê bi rê ve diçe, û li ser destêwerdanên re-

jîma Îranê ye.

Derheq pirograma şeweya karê taybet ê malî di navbera Îran û YE de jî, her çend divêt heya dawîya vê mehê lihevkerin pêk bê, lê berpirsyarên Şevra Karê Derve ê Ewropayê ragehandin ku heya dawîya sala 2019'an pirograma şeweya karê taybet ê malî di navbera Îran û YE de rê nakeve.

Hêjayî basê ye ku lihevnekirina li ser SPV û ceribandîna mûşekî û terorên bernamerêjîkirî ên rejîma Îranê di navxaka Ewropayê de, nakokîya di navbera YE û Îranê de zêdetir kiriye.

Karbidetsên rejîma Îranê heya niha çendî carî gef xwarine ku hekî pirograma şeweya karê taybet ê malî di navbera Îran û YE de ser negre, ewlehiya YE wê bikeve metirsîyê de, ku ew yek gefeke nerasterast e li YE.



## Yekîtiya Ewropayê nîgeraniya xwe derheq ceribandîna mûşekî yê Îranê nîşan da

**Y**ekîtiya Ewropayê di daxuyaniyekê de, nîgeraniya xwe derheq ceribandîna mûşekên balistîk yê rejîma Îranê nîşan da, û ji wê rejîmê daxwaz kir da ku, çalakiyên mûşekî yê xwe bisekinîne, ku bûne sebaba çêbûna bêbawerî, û nearamiya deverê.

Roja Dûşemî rêkefta 15'ê Rêbendanê, Yekîtiya Ewropayê bi belavkirina daxuyaniyekê derheq bernameyên mûşekî yê balistîk yê rejîmê hişdarî da.

Yekîtiya Ewropayê bi

awayekî micid li hemberî zêdebûna orthavêjî û pêkandîna mûşekên balistîk yê rejîma Îranê, nîgeraniya xwe nîşan da.

Herwisa di beşeke din a vê daxuyaniyê de hatiye ku: Hevdem digel zêdebûna asta ceribandîna mûşekan ji aliyê rejîmê ve, Îran hewl dide da ku, pêkan (hingavtin) û birkirina mûşekên xwe zêde bike, û ev çalakiyane ji bilî çêkirina bê baweriyê kûr, nearamiya deverê jî zêde dike.

Yekîtiya Ewropayê daxwaz

ji rejîma Îranê kiriye ku bi encam dana çalakiyên mûşekî yê xwe biryarnameya 2231 ya Şevra Ewlehiyî ya Saziya NY binpê dike, bila dawî pê bîne.

Rejîma Îranê hevdem digel dijberîkirina Amerîkayê, û piştî rêkeftinnameya navîkî a 2015'an, bernamêyên ceribandîna mûşekên balistîk yê xwe zêde kiriye, lê rejîm dibêje ku ewa tenê bernamêyek e bo berevanîkirinê, û tu yek ji mûşekan şiyana hilgirtina kilavên navîkî tunîn.

Herwisa Yekîtiya Ewropayê, li hemberî aloziyên Rojhilata Navîn, û hebûna rejîma Îran li Sûriyê, û piştevanîkirina rejîmê li Hizbulaha Lubnanê, nîgeraniya xwe nîşan da, û di vê daxuyaniyê de, daxwaz ji hemû aliyên şer yê, wekî Yemen û bi taybet rejîma Îranê kiriye, da ku dawî bi wan şer û aloziyane bînin, û piştevaniyê ji biryarnameya 2451 a Şevra Ewlehiyî bikin.

### »»» Doma manşetê

-Di sala 1358'an de, ji her 100 hezar kesî 23 kes di girtîgehê de bûn.

-Navenda Lêkolîna Meclîsê ragehand ku %12 ji xelkê tehranê di bi xeta hejariya reha (mutleq) de ne.  
-Parêzgeha Belûçîstanê, parêzgeha herî hejar e, ku bi awayekî navgîn %38 ji akinciyên wê, di bin xeta hejariyê de ne.

-2 milyon û 808 hezar mu'itad di Îranê de hene.

-Hersal 7500 zarokên mu'itad ji dayîk dibin.

-%20 ji civaka Îranê rastî nexweşiyên derûnî hatine.

Di asta navneteweyî de, derheq pirsê terorîzmê, cuda ji terorkirina cudahîzrên Kurd û Îranî ku yê herî zêq û berçav terorên li Vîyen û Birlînê ne, Komara Îslamî bi awayê rasterast dest di hindêk terorên din de jî hebûye, ku bi kurtî weha ne:  
Teqîna 1983 li Beyrûtê, Teqîna Amya li Arjantînê, Teqîna burcên Xober li Erebestanê, û Teqîna li Mekke di sala 1987'an de.

Herweha hindêk kiryarên terorîstî li Dêhlî, Tiflîs, Bankok, Bakû, Stokholm û Tirkiyê ku tê de biyanî kirin armanc.

Koma van amaran û datayan diselimîne ku 40 salan zalbûna zulmê li Îranê de, belgeya herî haşahilnegir e, bo mayepûçbûna rejîmê û hewcehiya herifîna wê.



## Dibin Mirovkuj û dixin stûyê Jinan!



Sefiye Xalidî

Li Rojhilatê Kurdistanê di van çend salên dawî de, li jêr navê “parastina Namûsê” gelek jin hatin kuştin û gelek mêr kevtin heps û zîndanên Îranê de. Ji ber kirîzên aborî, civakî, siyasî yên di bin sîbera Rejîma Îslamî ya Îranê de, gelek mirov bi destê hev hatin kuştin û hîna jî tîn kuştin.

Lêkolîn li ser sedemên wê şiddetê pir kêr in, û ji bo Rejîma Îslamî ya Îranê ne girîng e ku çi tê serê xelkê, bi taybet xelkê Kurd. Helbet ku bê`edaletî û sîstema rasîstî ya Rejîma Îslamî ya Îranê dibe sedema vê yekê ku jiyana gelek mirovên bê guneh di rewşeke pir xirap de bimeşe.

Li Rojhilatê Kurdistanê li jêr sîbera rijîmê bê`edaletî di her warekî de pişka xelkê kurd e. Kurd li warê xwandinê, karê nav dezgehên dewletî û ji mafê siyasî, civakî, aborî de bêpar in, ji ber vê yekê xelkê Kurd tûşî feqîriya kulturî û aborî dibin û feqîrî jî dibe sedema şiddetê di civakê û di nav malbatê de.

Helbet zilam zêdetir ji jinan dibin qurbaniya feqîriya aborî, ji ber ku li gorî kultura Kurdî û Îslamî û herwisa Kultura mêrserdestî dibe hertim zilam di hizra rewşa aborî wekî xwarin û vexwarin, kirîna kel û pelan û ...hwd de be. Ew yek dibe sedem ku zilam ji bo meşandina jiyaneke normal tûşî gelek pirsgirêkan bin û gelek rêyên xeter û nebaş wekî firotina madeyên hişber, karê qaçax û gelek tiştên din biceribînin, dibe sedem ku zilam ji ber fişara ruhî gelek zû şidetê bikar bînin û heya radeyekê tûşî feqîriyê bin û ew qas biçin pêş Ku kuştina heval, cîran, bira, bav ji bo wan gelek rihet be.

Di Kultur û sîstemek mêrserdestî de, zilam xwe xwedî şiyar û



**Dûr ji mirovahiyê ye, û bêzagonî ye ku mirov serdestiya xwe ji bo sûçdarkirina kesek din bikar bîne.**

**Çima Jinan bêrûmet dikin?**



hêzek taybet dibînin. Rejîma mêrserdest û Îslamî ya Îranê ji bo rizgarkirina zilaman ji kirîzan û pirsgirêkan gelek qanûn danîne.

Nimûneyek gelek berçav ku dikarim amaje pê bikim ew e ku zilam li dan û standinan de yan nerazî ne, yan malê wan tê xwarin ji ber vê yekê hevkar, cîran, xizim û birayê xwe dikujin. Ji bo ku tûşî hikmê qisasê nebin, wê bûyerê dixin stûyê jinan, anku dibêjin ji ber babeta namûsê min ew kar kir. Li gor made zagona

302 a cezayên îslamî, dema ku zilam bi sedema destdirêjiyê yan ku têkeliya jina wî digel kesek din tûşî kuştina mirovan be, nayê qesaskirin.

Zilam ji bo rizgarkirina canê xwe û ji bo ku hepsa wan zêde nebe, jin, qîz, û xwîşka xwe sûçdar dikin. Mixabin ser vê yekê nafikirin ku çi tê serê jinan û çiqas bêbextiyê di gel pêşeroja malbatê û civakê dikin. Di gelek bûyeran de zarokên wan jî tûşî pêşerojek tarî

û nexweş dibin, ji ber ku malbata wan hildiweşe û li her derê bi wan tê gotin ku tu zarokê mirovkujan î, û em naxwazin digel te hevaltiyê bikin, û her wisa di gel ku têkeliya civakî ji bo wan pir zehmet dibe, li xwandingehê de jî nexwaşiyên dibînin.

Dûr ji mirovahiyê ye, û bêzagonî ye ku mirov serdestiya xwe ji bo sûçdarkirina kesek din bikar bîne. Çima Jinan bêrûmet dikin? Boxtan û bêrêziya der heq jinan dibe sedema feqîriya kulturî û civakî. Gelo xelkê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê heya çî radeyekê rê didin ku kultura Îslamî û şovenîzma Îranê, serdestiya wan bike? Rast e ku ji ber kirîza aborî, jiyana pir zehmet bûye, lê di demê zû de ew astengî jî wê rabin, û kuştina însanekê bi taybet heval û xizman ne çare ye, û ne rêya durist e. Binpêkirina jinan dibe sedem ku civak di kevneşopiyên xwe de berdewam be.

Mixabin li ser navê namûsê kuştina jinan li Îranê, zêde di civaka kurdî de rû dide. Zilam dibe bizanin ku rê û rêbazên perwerdekirina malbatan di bin bandora zêhniyeta wan de ye, lewma dibe ku mafê jiyaneke birûmet bidin malbatên xwe û îznê nedin ku Rejîma Îranê xelkê Kurd û ramana Kurd bike leyîstuka xwe. Jin namûsa Zilamê nîne, jin namûsa xwe ye, û çarenûsa wê nabe bikeve destê zilam û kevneşopiyên civakê de.

## Mîrê Bilûrê xatirê xwe ji jiyane xwest

**E**gîdê Cimo Mîrê Bilûrê, stêrkek din ê muzika gelê Kurdistanê rijiya

Mîrê Bilûrê jê re tê gotin.

Di hemû rengên muzika Kurdî de mirov dikare şopa wî bibîne.

Taybet di radyoya Erivanê de, xwediyê xebatek mezin a Muzika Kurdî bû.

Her Kurdek welatparêz û evîndarên Muzika Kurdî, bi dengê bilûra wî Mezin bû ye.

Hunermendê Kurd Egîdê Cimo çû ber dilovaniya Xwedê.

Mîrê Bilûrê, evîndarê hûner û muzika Kurdî.

Mîrê Bilûra Kurdî, bi dengê bilûra xwe ve, di dilê her take Kurdek welatparêz de, bêyî ku em bizan in, ew keda Egîdê Cimo û muzika wî ye, çîhek taybet girtiye.

Ji demên kevîn de gelek kevin de, nefesa wî evîndariyek bo dîrok, kul û azarên, gel, çol û çiyayên me, durist kiriye.

Mîrê Bilûra Kurdî Egîdê Cimo, ji hunermendan bigre, siyasetmedar, ciwan, sinemakar, wêjezan û akademisyenan ve, baş nasdikin û dengê muzika wî bandor li ser hemûyan kiriye.

Egîdê Cimo her dem xwediyê

projejen netewî yên huner û muzika Kurdî bûye.

Mûzika stranên Welatê me Kurdistane, Berivanê, Lawkê Metinî, Hekimo û Nurê - Rîzo ji xebatên pîroz ên Egîdê Cimo bûn e.

Mîrê Bilora Kurdî Egîdê Cimo, di sala 1932 an de, li Gundê Erdeşer ya Ermenistanê jidayik dibe.

Malbata wî di salên 1918 an de, ji Bajarê Wan a Bakurê Kurdistanê Navçeya Bêgirê, koçî Ermenistanê dibe.

Hêştta di heşt saliya xwe de dest bi jenîna bilûrê dike. Paşê fêrî jenîna zurnayê, neyê, duzelê û tembore dibe.

Mîrê Bilorê, hêştta Zarok diya wî dimire û hêtmî mezin dibe. Diyare ku sêvitiya xwe, kul û azarên xwe bi bilûrê derbirîye.

Egîdê Cimo di sala 1955 an de, dema radyoya Erivanê vedibe, di avakirina wê de, çîh digre.

Wek muzikjen di xebata radyoya Erivanê de çîh digre. Kolan kolan mal mal digere, hunermend û muzika kurdî peyda dike.

Hemûyan di radyoya Erivanê de kom vedike.

Mîrê Bilûrê Egîdê Cimo: Di xebata Muzika Aram Tigran, Kerabête Xaço, Efroyê Esed, Eslika Qadir, Aram Tigran, Suska Simo, Xana Zazê û bi dehan muzisyenên din de, çîh digre.

Mîrê Bilorê di salên 1960 an de, keça binavê Rindê nas dike û direvîne, dibe gundek din. Dibin xwediyê 5 zarokan. Dibêje: min gelek jê hes dikir. Piştî ku ew dimire nazewice.

Egîdê Cimo Di sala 1967 an de, Peymangeha Muzikê ya Melikyan Romanos de xwend û bû xwediyê diplomê.



## Jiyana kemanjenê ji Kobanî «Hemedê Dûman» bû belgefilm

**J**iyana 90 salî ya dengbêj û kemanjenê ji Kobanî «Hemedê Dûman» bû belgefilm û ew tê de wesiyeta xwe, bi zimanê Dûmanên Kobanî tembe û tekez dike.

Hunermend û lêkolerê mûzîkê Memo Seyda, belgefilmek bi navnîşana «Dûman, Refek Kevok, Dîrok û Bîrok» li ser jiyana 90 salî ya dengbêj û kemanjenê Kurd, Mihemed Xelîl Xazî ku li herêma Kobanî bi navê Hemedê Dûman tê nasîn û navdar e, amede kiriye.

Amedekarê belgefilma «Dûman, Refek Kevok, Dîrok û Bîrok» hunermend û lêkoler Memo Seyda, ew belgefilm weke nameya derçûna xwe ya masterê, ji beşê muzikolojiya ji Zanîngeha Stenbolê ya Teknîkê bi dirêjahiya 48 deqeyan amede kiriye.

Malbata Hemedê Dûman bi eslê xwe ji navçeya Pirdê ya ser bi Kerkûka Başûrê Kurdistanê ve ye, lê ew malbat, ji berî 7 bavan ve, li Kerkûkê xwînî bibû û koçberî Deştê Sirûcê û herêma Kobanî li Rojavayê Kurdistanê bibû.

Dengbêj û kemanjenê Hemedê Dûman di sala 1929an de li bajarokê Şêranê li herêma Kobanî ji dayik bûye, piştî êrîşa DAIŞê li ser herêma Kobanî di sala 2014an de, ew jî koçberî Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê bibû û ew niha di temenê xwe yê 90 salî de, li bajarê Qonya yê Tirkiyê dijî.



## Zimanê Kurdî

- Raweyên daxwazî :

- Gerek kî hevalê te bûya ? ( )

- Gerek Reşo hevalê min bûya)

2- Bi karên nederhingêv re :

Cînavê (kî) di hemû dem û raweyên karên

Nederhingêv (têneper) de, cihê navan digre:

- Dema bûrî : - Kî ket ? Kî ketin ? - Kî ketiye ? Kî ketine ? - Kî diket ? Kî diketin ? - Kî ketibû ? Kî ketibûn ?

- Dema nuho : - Kî dikeve ? - Kî dikevin ?

- Dema paşeroj : - Kî yê (dê) bikeve ? - Kî yê bikevin ?

- Raweyên daxwazî : - Bila kî biketaya ? - Gerek kî ketibana ?

3- Bi karên derhingêv (têper) re :

Cînavê (kî) bi karê derhingêv re (dema bûrî), cihê berkarê rasteder digre :

- Te kî dît ? (min Zîn dît) - Zînê kî dît ? (Zînê birayên xwe dît).

- Dema nuho : - Kî gotarê dinivîse ? - Kî gotaran dinivîsin ?

- Dema paşeroj : - Kî yê gotarê binivîse ? - Kî yê gotarê bixwînin ? (Em ê gotarê bixwînin)

- Raweyên daxwazî : ( ) - Te dixwest, kî gotarê binivîse ? - Gerek kî gotaran binivîsin ? Di pêvajoya (pêwera) hevokê de cînavê (kî) dibe kara (kirde, kiryar) : - Kî çû û kî hat ? - Kî dermanan difroşe ? Li wê gorê, dibe berkar (bireser) jî : - Te kî dît ? - Reşo kî biriye gundê xwe ?

“Kê” : Cînavê (kê) jî bo hişmendana (mirovan) tenê bikar tê û cihê navên her dû zayendên yekjimar û komjimar digre.

Mînak : - Tu li kê digerî ? ( Ez li Şêro digirim) ( Ez li Zînê digirim) - Hûn kê dibînin ? ( Em birayên xwe

dibînin) ( Em xuşkên xwe dibînin) Ev cînav, weku cînavên kesîn, yên koma (min) di raweyên verêse (tewangê) de bikar tê. Anku, cînavê (kê) berevajî cînavê (kî) cihê navan digre. Ji ber vê egerê ez dibînim ku, her dû cînav yek in. (Kî) di raweya rasteder (rastewxo) de ye û di raweya verêse (tewangê) de dibe (kê) .

Wek : - Kî dilbera Siyamend bû ? ( Xec dilbera Siyamend bû) - Siyamend ji kê hez dikir ? ( Siyamend ji Xecê hez dikir)

Di van mînakana de, çawa navê (Xec) û (Xecê) yek in, wisan jî cînavê (kî) û (kê) her dû yek in.

Cînavê (kê) di van dem û raweyan de cihê navên berverêse digre :

1- Bi karên derhingêv re :

Cînavê (kê) bi karên derhingêv (têper) re bikar tê û dibe kara (kirde) û berkarên rasteder û nerasteder.

a- Kara :

Di her çar raweyên dema bûrî de cînavê (kê) dibe kara WeK: - Kê hinar çinî ? (yek hinar) - Kê hinar çiniye ? - Kê hinar diçinî ? - Kê hinar çinîbû ? Di van mînakana de cînavê (kê) li şûna navê wî kesê hinar çiniye bikar hatiye. Anku, di pêvajoya hevokana de kara ye. (Kê) di dema bûrî tenê de dibe kara. b- Berkarê rasteder : Cînavê (kê) bi karên derhingêv re, di dema nuho, paşeroj û raweyên daxwazî de, dibe berkarê rasteder :

- Dema nuho: - Tu kê dibînî ? - Nêrgiz kê dixwaze ?

- Dema paşeroj : - Tu yê kê bibînî ? - Nêrgiz ê kê bixwaze ?

- Raweyên daxwazî : - Gerek tu kê bibînî ? - Bila Nêrgiz kê bixwaze ?

C- Berkarê nerasteder :

1- Bi karên derhingêv re : Cînavê (kê) dibe berkarê nerasteder, ku li pey karên derhingêv bikar bê : - Şêrgo pênûs daye kê ? - Şêrgo pênûsê dide kê ? - Şêrgo dê pênûsê bide kê ? - Gerek Şêrgo pênûsê bide kê ?

2- Bi karên nederhingêv re : Cînavê (kê) li pey karên nederhingêv (têneper) tê û dibe berkarê nerasteder : - Ma awira te ketibû kê ? - Dilê Şêrgo ketiye kê ?

**Dom heye...**

# Agirî

- ◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ [www.Kurdistanmedia.com](http://www.Kurdistanmedia.com)
- ◆ [www.Agirimedia.org](http://www.Agirimedia.org)
- ◆ [rojnamaagiri@gmail.com](mailto:rojnamaagiri@gmail.com)
- ◆ [www.facebook.com/Agirikirmanji](https://www.facebook.com/Agirikirmanji)

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: [Agiri2003@gmail.com](mailto:Agiri2003@gmail.com)

Hejmar (343)

## Çend wêne ji merasima bidawîhatina dewreya 234 a destpêkî a Pêşmerge

